# Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (235) | Çileya Pêşîn / 15-12-2022


# Daketina nirxê lîreya Sûrî bandoreke mezin li rewşa xelkê kiriye




**Ehmed Cuma**

Li Kurdistana Sûriyê û Sûriyê bi giştî daketina nirxê lîreya Sûrî beramber Dolarê Emerîkî, bandoreke zêde ya xerab li rewşa rojane ya welatiyan kiriye û ew di rewşeke zehmet de dijîn, ev yek di demekê de ye ku rojane nirxê keresteyên sereke buha bûne û karînên welatiyan yên kirînê nînin. Nepabendbûna rejîma Sûriyê bi biryarên navdewletî û reva wê ji çareseriya siyasî, hiştiye ku dorpêçên welatên Rojava û Emerîka li ser Sûriyê berdewam bin, vê yekê jî bandoreke nerênî ya rasterast li welatiyan kiriye.

Rojnameya Kurdistan nerîna hin welatiyan di vê derbarê de wergirtiye. Welatiyek wiha li ser vê mijarê dibêje:"Rewşa xelkê gelekî xerab bûye, hin malbat hene heqê nanê wan bi wan re nîne, niha nan buha kirine, mazot buha ye, di demekê de ku mazot ji cem me diçe deverên din, ev desthilata heyî li Kurdistana Sûriyê her tişt li xelkê buha kiriye û gendeliyeke mezin li deverên me hene, û ti kes nikare biaxive, niha hemû xelk li rêyekê digerin heta ku ji vê de bar bikin, tekez ewê ligel vê desthilatê kar dike dixwaze rojekê pêştir koç bike, ne tenê rewşa me rewşa wan jî ne baş e".

Welatiyekî din jî wiha dibêje:"Niha dolar bûye zêdetirî 6 hezar û 100 lîreyan, bê guman yekser kelûpel buha dibin, vê yekê bargiraniyeke mezin li ser mile welatiyan dirust kiriye, ne xaz, ne av, ne mazot,ne elikitrîk, ev in pêdviyên rojane, heger ev nebin dê xelk çawa jiyana xwe birêve bibin".

Welatiyek dibêje:"Xelkê dewlemend jî di rewşeke xerab de ne, rast e pere li cem wan hene, lê ew jî li ser jiyana xwe û ya zarokên xwe ditirsin, heta tiştekî bidest dixin bi zehmetî, lewma piraniya wan zarokên xwe şandina ji derveyî welat"


**“Pêwîste çareserî li gor biryara 2254 be”** *Rûpel—3*

**“Ji ber rewşa mirovî û ewlekarî Kurdistana Sûriyê di qonaxeke zehmet de derbas dibe”** *Rûpel—2*

**Alaya Kurdistanê semboleke pîroz a Kurdan e** *Rûpel—4*

# «Ji ber rewşa mirovî û ewlekarî Kurdistana Sûriyê di qonaxeke zehmet de derbas dibe»



**Kurdistan**

Mekteba Siyasî ya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S raporta xwe ya mehane belav kir û têde ragehand: Di dema dawî de, topbaran û bombebarana Tirkiyê bo ser deverên sînorî li Kurdistana Sûriyê ji 20ê Çirya Pêşîn ve û heta niha berdewam e, ku hejmareke baregehên Hêzên Sûriya Demokrat HSD û kêlgehên petrolê kirine armanc, herwiha gefên Tirkiyê bo ser her yek ji Tilrifet û Kobanê Minbicê berdewam in û ji her yek ji Emerîka û Rûsiya dike Hêzên Sûriya Demokrat HSD ji wan deveran dûr bixe.Di rastiyê de, û ligel nêzîkbûna hilbijartinên Hezîrana 2023an, Tirkiyê dixwaze tedbîrên nû ji Rewşa Sûriyê re bike, piştî guhertina nerîna wê ji krîza Sûriyê ji bo ku xwe ji penaberanên Sûrî rizgar bike û wê bargiraniyê li ser xwe sivik bike, herwiha kêmkirina metirsiya HSD li ser sînorê xwe wek ew dibêje, û dibîne ku aktîvkirina rêkeftina Edene ya sala 1998an di navbera Tirkiyê û Sûriyê de rêyek ji bo armanca xwe, û Tirkiyê ti derfetekê nabîne jibilî lihevhatina ligel rejîma Sûriyê û istixlala opozîsyona Sûriyê ku ji bo berjewendiyên xwe yên siyasî bikar tîne û wê ligel HSD û rêveberiya PYD beramber dike û ev yek jî rejîma Sûriyê jî dixwaze, û di vê çarçoveyê de jî hevdîtinên istixbaratî di navbera herdu aliyan de hatine kirin ji bo tedbîrên nû, û destpêkê Tirkiyê destpê kir dema ku çekdarên Desteya Tehrîr El-Şam şandine Efrînê û piştre amadekirin ji bo operasyoneke serbazî ji hin deverên sînorî li Sûriyê, tiştê ku rejîma Sûriyê dilgran nake, û ev yek nîşaneya wê yekê ye rejîm di nava van lihevhatinan de ye. Rûsiya fedral aliyê giring di vê prosêsê de dibîne ji ber ku ew xizmeta rejîma Sûriyê dike, û wê plan ji bo vê yekê kiriye lgel her yek ji Tirkiyê û Îranê di rêya Soçî û Astanayê, û kar di ware cîbicîkirina wê di ware praktîkî de ligel rejîma Sûriyê û Tirkiyê dike, ji ber ku ew roleke sereke di krîza Sûriyê de dilîze, herwiha hewil dide ku welatekî gerantîkar be ji bo vegerandina xaka Sûriyê yên di jêr destê Tirkiyê de piştî nehiştina hesabatên opozîsyona Sûriyê û HSD û mijara penaberên li Tirkiyê,

> «Rola Rûsiyê di krîza Sûriyê de giring e»

ji bo vegerandina pêwendiyên dîplomasî di navbera Sûriyê û Tikriyê, piştî hevdîtina çaverêkirî ya di navbera Beşar Esed û Serokomarê Tirkiyê ku li ser daxwaza Tirkiyê dê were kirin. Emerîka tişta wê û HSD kom dike tenê şerê dijî rêxistina DAIŞê ye, li gor serderiyên hejmareke berpirsên Emerîkî, û tevî vê yekê jî dijatiya Emerîka ji vê operasyonê de tund û bihêz bû , tevî ku Tirkiyê hevalbendekî steratejîk yê Emerîka ye, berûvajî tişta pêşbînîkirî bû ku tevgera Tirkiyê bi erêkirina Emerîka bûye wek çawa li Efrîn û Girêsipî û Serêkaniyê, ji berk u HSD û PYD ne li gor xwesteka Emerîka ne di çarçoveya tedbîrên Emerîka li Rojhilatê Feratê, wê soz da jibilî van deveran ji yasaya Sîzer û piştevaniya wê ji aliyê civakî û abûrî ve, û dibe nîşaneyên siyasî, di çarçoveya krîza Sûriyê de heta niha helwesta Emerîka ligel biryarên civaka navdewletî û taybet 2254 û lêvegera Cinêv 1. Îran jî li ser van tedbîrên nû li Sûriyê razî ye wek piştevaniyek ji rejîma Sûriyê re, lê di pirsa PKK û PYD ew ne ligel Tirkiyê ye ku li Qendîlê hevalbendê PKK ye û piştevaniya wê dike ji bo ku armancên wê li Kurdistana Îraqê.

> «Tenê şerê DAIŞ Emerîka û HSD lihev kom dike»

Kurdistana Rojava, di rews û qonaxeke zehmet de derbas dibe ji ber rewşa mirovî ya xerab, û zêdebûna bêkariyê û daketina nirxê lîreya Sûrî beramber dolarê Emerîkî, herwiha nekarîne kirîna malbatan ji kelûpelan re, û duduliya berdewam ya civakê û bi taybet li deverên sînorî ji ber êrêşên Tirkiyê, herwiha rêveberiya PYD rewşa xelkê xerabtir dike di rêya sepandina bacan û revandina ciwanan ji bo serbaziya neçar û revandina zarokan, jiblî vê yekê helwestên nerênî dijî Encûmena Nştîmaniya Kurdî li Sûriyê û pêkhateyên wê, herwî dawî nehiştina lidarxistina kongreya ENKS ji aliyê asayîşê ve.

# «Pêwîste çareserî li gor biryara 2254 be «

Şandeke Bereya Aştî û Azadiyê li Mosko paytexta Rûsyayê ligel Wezîrê Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov civiya û li ser pêşhatên li Sûriye û navçeyê gotûbêj kirin. Roja 8ê Kanûna 2022yan, şandeke Bereya Aştî û Azadiyê, ku bi serokatiya Ehmed Cerba û bi amadebûna Kamîran Haco û Gibraîl Mûşê, li Moskowê ligel Sergey Lavrov civiyan. Bereya Aştî û Azadiyê di



daxuyaniyekê de ragihand, di civînê de herdu aliyan civînên girîng û serkeftî encam dan û li ser pêşhatên li Sûriye û navçeyê gotûbêj kirin û bal kişandin ser girîngiya dîtina çareseriya siyasî ji bo krîza Sûriyê li gor biryara Encûmena Asayîşa Navdewletî ya hejmara 2254an. Hat diyarkirin, aliyê Rûsî tekezî li ser piştevaniya xwe ya dewleta Sûriyê û yekbûn û silametiya xaka wê kiriye, herwiha girîngiya hemû hewldanên navdewletî yên ji bo alîkariya başkirina rewşa mirovî dubare kiriye. Di heman rojê de, şanda Bereya Aştî û Azadiyê ligel Nûnerê Taybetê Serokê Rûsya bo Rojhilata Navîn û Efrîqayê û Cîgirê Wezîrê Derve yê Rûsyayê Mikhail Bogdanov civiya û pêşhat û geşedanên herî dawî yên Sûriyê gotûbêj kirin.

# 6 sal li ser şehîdbûna xebatkar Selah Yûnis re derbas dibin



**Kurdistan**

Salah Yûnis di 6-14-2016 de ji aliyê çekdarên PYDê ve hate girtin û 3ê mehan di girtîgehê de ma, bi tawana qaçaxçîtiya xortan û hevkariya wan bo Pêşmerge. Ew serbest hate berdan piştî ku li zîndanên PYDê ji çavekî kûr bû, û berê xwe da Herêma Kurdistanê ji bo çareserkirina pizîşkî, li nexweşxaneyên Hawlêrê piştî ku di girtîgehên PYDê de bi nexweşiya Penceşêrê ket. Endamê encûmena herêmî yê Partiya Demuqata Kurdistan - Sûriya PDK-S Salah Yûnis li Herêma Kurdistanê di 5ê Berçileya 2016an de jiyana xwe ji dest da.

Selah Yûnis kî ye:

Selah Yûnis jidaykbûyê gundê Til Hebeş yê gundewarê Amûdê ye, sala 1968an e, xêzandar bû û bavê 5 zarokan e, xwendina xwe ya seretayê, amedeyê û navendî li dibistanên Amûdê bi dawî kiribû. Sala 1987an tevlî Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya bû, endamê encûmena herêmî yê PDK-Sê li bajarê Amûdê bû, sala 2012- 2013 beşdarî di xuleya amedekirina kadirên siyasî li Herêma Kurdistnê kirbû, 5 caran li ser destê rêjîma Esed hate girtin û cara 6an li ser destê çekdarên PYDê hate girtin, di sala 2005an de li ser destê sêxuriya rêjîma Esed hate girtin bi tometa belavkirina nûçeyên nerast ku ziyanê dighînê rêjîma Sûriyê hat girtin , ji girtîgiha şaxê Feyha yê sûxuriya rêjîmê ve hat veguhestin û piştî salekê hat serbestberdan. Ew bi tawana belavkirina belavokên kurdî di 6/28/2008 de ji hêla Ewlehiya Leşkerî ve hate girtin. Di 12/21/2009 de hat serbestberdan.

# Kiwêt avakirina projeyên niştecîbûnê ji bo koçberên Ereb li Efrînê radwestîne

**Bidûvçûn**

Piştî beşdarbûna wê di guhertina demografî li Efrînê de, Wezareta Karûbarên Civakî ya Kuweytê dayîna moletên cîbicîkirina pirojeyên avedankirinê li Sûriyê rawestand. Wezareta Karûbarên Civakî û Kar a Kuweytê nivîsek arasteyî serokên encûmena rêveber yên komeleyên xêrxwaziyê yên wî welatî kir û ji wan xwest ku dayîna moletên cîbicîkirina projeyên avedankirinê yên xêrxwaziyê li Sûriyê rawestînin. Piştî dagîrkirina Efrînê ji aliyê artêşa Tirkiyê û grûpên çekdar ên ser bi wê ve di Adara 2018an de û bi armanca guhartina nasname û demografiya Efrînê, bi hevkariya hin dezgehên xêrxwazî yên welatên Ereban ji wan jî Kuweyt û Filistînê, hin komelgehên nişticihbûnê ji Erebên hawerde yên li Efrînê hatine bicihkirin re hatine avakirin, wek gundê Kuweyt Rehme û gundê Besme û çend komelgehên din.

# Alaya Kurdistanê semboleke pîroz a Kurdan e




Alaya Kurdistanê ji jor ber bi jêr ve, ew ala Kurdan e, ser hev ji sê zemînan pêk tê. Dirêjî û firehiya her sê zemînan weke hev mezin in. Zemîna li jor bi rengê xwe sor e, ya navîn spî ye û ya jêr jî kesk e. Firehiya alayê 2/3 cara dirêjiya wê ye. Dîametra cerga rojê bi tevî tîrêjên xwe re 1.0 e û bê tîrêjan 0.5 e. Hawirdorê cerga rojê, bi 21 tîrejên wekhev hatiye xemilandin. Dawiya tîrêjan tûj e û tîrêj ji herdu aliyên xwe ve bi xêzeke rast pêk tên. Bingehê tîrêjên rojê bê navber li ser zemîna cerga rojê digihin hev du. Roj bi awayekê geometrîk cihê xwe di nîvê alayê de digire. Roj bi awayê emûde, ku vektor di nava tîrêja jorîn de derbas dibe, hatiye bicihkirin. Taybetiya alê a bingehîn nîşana roja zêrîn e. Nîşana rojê di dîroka kurdan de wateya xwe ya olî û çandî heye. Nîşana rojê bi 21 tîrêjên xwe, nûjînê nîşan didî, hejmara 21 di Dînên kurdan, wek Yezdaniyê de, çevenga vejînê ye. Roj û agir sembola azadî û ronahiyê ne. Herwiha Newroz bi xwe re demsala biharê jî têne. Rengê sor, xwîna Pakrewanên Kurdistanê nîşan dide. Rengê kesk siruşt û xwezaya Kurdistanê sembole dikê. Rengê spî aştîxwazî û aramîya gelê kurd sembole dike. Ala neteweyî cara pêşî ji hêla rêberên Tevgera Xoybûnê ve, ji bo nûneratiya kurdên li hemberî împeratoriya Osmanî ya li ber têkçûnê têkoşîna serxwebûnê didin, hatiye diyarkirin. Di Kovara Hawarê de li ser alayê gelek nivîs û helbest hatine nivîsandin. Celadet Alî Bedirxan di gotareke xwe de wiha ala kurdan dide nasîn û dibêje: « Her milet xweyiyê aleqê ye. Al nîşana milet û welat e. Tevayiya heyîna miletan di ala wan de civiyaye. Al namûs, rûmet û bextê miletan e. Zarowên her miletî ji bona bilindî û bikedrbûna ala xwe, beperwa xwe didin qûştin. Ala her miletî jê re beha ye. Di cejn û şahînetan de kesr, xanî û qûçayan pê dixemilînin, di ber wêre diborn, slavan lê diqin, di rêveçûna leşqerî de diveqin pêşiyê. Lê alên miletên dîl, weq ya miletê me, ji her der biderqirî, lihevtewandî li ser dilên zarowên wan de hilandî ne. Miletên dîl dixebitin xwîneên xwe dirijênin qo biyaniyan ji welatên xwe bikewirinin û alên xwe li ser qalat û bajarên xwe ji nû ve daçiqînin. Ala her miletî bi çend rengan û bi şiqleqî din e. Ala kurdan, ji jor ber bi jêr ve, ser hev, qesq, sipî û sor e, di nava wê de Çiyayê Agirî û Roj diçirise. » Ala Kurdistanê, 77 sal berî niha di 17ê Kanûna 1945 de li ser banê Komara Kurdistanê û ji aliyê yekemîn Serokomarê Kurdistanê Qazî Mihemed ve li paytexta komarê bajarê Mihabadê hat bilindkirin. Lê Ala Kurdistanê di heyama salên 1927-30 de jî ji aliyê Rêberê Serhildana Agirî, Ihsan Nûrî Paşa ve jî hatibû bilindkirin. Parastina Ala Kurdistanê wek nirxekî netewî û hildana wê hertim li cem Kurdan û serkirdeyên tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê wek tiştekî pîroz ma. Roja Ala Kurdistanê Parlamentoya Kurdistanê di sala 2009an biryar da, ku êdî her sal roja 17ê Kanûnê wek "Roja Ala Kurdistanê" were pîrozkirin. Ji wê demê ve heta niha ne tenê li Başûrê Kurdistanê, lê belê li tevahiya Kurdistana mezin û li cîhanê ev roj ji aliyê Kurdan ve tê pîrozkirin. Li Başûrê Kurdistanê di roja Ala Kurdistanê de, hemû bajar û bajarok bi ala rengîn tên xemilandin û li hemû bajaran çalakiyên cor bi cor tên lidarxistin. Serok Mesûd Barzanî jî derbarê Ala Kurdistanê de dibêje: "Ez ji bo serxwebûna Kurdistanê û di yekemîn Komara Kurdistanê de li Mihabadê û di bin siya Ala Kurdistanê de ji dayik bûm û dixwazim di bin siya Ala Kurdistaneke serbixwe de bimrim." Berê jî li hemû sazî û dezgehên hikûmeta Herêma Kurdistanê Ala Kurdistanê dihate bilindkirin. Lê Serokatiya Herêma Kurdistanê, di sala 2006ê de bi fermana jimare 60, bi awayeke fermî biryara bilindkirina Ala Kurdistanê li hemû sazî û dezgehên hikûmî derxist.